

Gelên Ereb û rizgariya siyasî

Rozad Elî

Tevgerên nerazîbûnê û serhildanên gelêrî ku li piraniya dewletên Rojhilata Navîn radibin, nemaze jî li hin dewletên erebî, bi tevahî di çarçewa pêkanîna çend daxwazên sereke de digerin: ((kar, azadî û rûmeta mirov)).

Gava em li dîroka gelên Rojhilata Navîn vegerin, emê bibînin ku gelên Ereb ji sedsalan ve di bin nîrê dagîrkirinê de bûn û ji serweriya xwe ya neteweyî bêpar mabûn.

Lê, di encama herdu şerên cîhanî yê yekê û diduyê de, sînorine siyasî yên nû li Rojhilata Navîn hatin danîn, û dewletên Ereb yên ku niha hene hatin damezrandin, û ji derdora 60 salî ve jî serweriya xwe ya niştîmanî, wek millet û sînor, bi dest xistin û bûn dewletine serbixwe.

Di demên damezrandina wan dewletan û bidestxistina serbixwebûnê de, civakên Ereb jî mîna piraniya civakên ku demeke dirêj di bin barê dagîrkirinê de dimînin, rewşên wan jî lişûnmayî û xizan bûn. Ango, ew jî ji pêzanîna şeweya avakirina dewletan û gerandina siyasî dîr bûn, tenê nofêkî biçûk ji dewlemendên xwende, û hin efserên serbazan ji birêvebirina siyasî, dewletê û desthilatê re amade bûn.

Ji bilî ku, li destpêka bidestxistina serbixwebûnê, mijarên çawahî û şeweyên damezrandina dewlet û sazûmanan û birêvebirina wan jî li ba beşê herî mezin ji gel ne cihê pirsê bû. Loma, jî ji destpêka salên serbixwebûnê ve, saziyên dewletê, desthilat û rêvebirina wan, kete destê nofêke biçûk ji mirovên xwedî sermiyan, û hin serdar û efserên leşkeran. Ew nofa serdest a biçûk, destlat û dewlet li gora berjewendiyên xwe ava kirin, û sazûman û zagonên wê yên bingeş jî li gora daxwaz

û baweriyên nofa xwe, yan jî ji bo parastina destladariya partiyekê, nofêk olî, yan jî hozekê danîn.

Li gora pergalên giştî yên ew sazûmanên nû, piraniya pir ji gel, ji karûbarên dewletê û çêkirin û gerandina siyaseta wê hat dîrxistin, û bi demê re mafên wî yên herî bingeş, mîna "azadî, hîlbijartinên durust, dad, jiyanekê bi rûmet,..." jî jê hatin standin, û herwiha destlatên bê azadî û ne demokratîk cihê xwe girtin. Gelek caran diktetoriyet û olîgerşîya destgiran jî, ji zîkê wan sazûmanan derketin, mîna sazûmana Sedam li Îraqê û H.W.D.

Bi şeweyekî tevehî em kanin bêjin, rast e ku milletên Ereb di têkoşîna rizgariya niştîmanî de bi ser ketin, û sînorên xakesiyasî yên dewletên xwe danîn, û nav û al jî ji wan re çespendin. Ê belê, tîkoşîna wan di çarçewa sînorên rizgariya netewî de sekinîn û derbas warê pêkanîna dewletên yaseyî û demokratîk nebûn, û tu xebatên bi encam jî ji ber ve nehatin kirin.

Loma jî, bêdadiya civakî û rewşên bê demokratî û bê azadî ku bi avakirina dewletên Ereb re hatin, wek xwe man û bi demê re hîn aloztir bûn. Destlatdarên ku hatin ser postên dewletê jî, hewildanên guhertinên pêwîst û hemdemî di sazûmanên xwe de pêk nanîn. Di wan rewşan de, tovên nakokiyên civakî û qeyranên siyasî ewên ku ji destpêka damezrandina dewletan de mabûn, roj li dû rojê mezin û gur bûn, û rewşên tevahî yên civakan gihandin sînorên peqîn û serhildanan.

Li Sûryê jî, bi tevahî, rewş bi wî rengî bi rê ve çûye, û gelê Sûrî jî ji sala 1945an de, ji hemî mafên xwe yên bingeş mehrûm bûye. Ango, li dirêjîya 66 salan û ta roj îro, pêwendiyên di navbera destlatdaran û gel de durust nebûne.

D.R. 7